# Rênîşan ji bo bidestxistina xaniyê xwe ê taybet

*Bo penaber û koçberan*

(Kumanci)

DORMAGEN
Natürlich! Am Rhein.



# Naverok


## Pêşgotin ..................................................................................................... 3

## 1. Beriya birina malê ........................................................................... 3

Pêdiviyên bidestxistina Xaniye xwe ê taybet

Lêgerîna bo Xaniyekî

Bihayê Xanî

*Pêdivî*

*Cihazên bingehîn*

*Nûsazî*

Destûra malên bi yarmetî

Navnivîsiya maleke civakî

## 2. Piştî birina malê ........................................................................... 7

Paqijkirina korîdorê

Rêznameya Xanî (Nizama)

Germkirin û (Balêxistin) balêdan

Tune kirina zibla malê be rêka boriyên Avkişê û tewalêtê

Cudakirina zibilan

*Kaxizên kevn (zibildanka kesk/hêşîn)*

*Zibildanka Bio (zibildanka qemer)*

*Zibildanka/kîsê zer*

*Bermaya pirtikan (zibildanka boz)*

*Zibila metirsîdar*

*Zibila elektronîk*

*Zibila gir*

**3. Bernamedana mesrefên kelmelên malê .................................... 12**

Elektrîk

Telefon / Internet

TV

Sîgorte

Kirrînên nû

Mesrefên zêde

**4. Têbînî ........................................................................................................ 14**

**5. Pêvek ........................................................................................................ 15**

Sînorên herî bilind ên kirê (kiriyê)  (ji 1 February 2017)

Çêklîsta kirêkirina apartimanê

Çêklîsta valakirina xanî/apartimenê

## *Pêşgotin*

Ev rênîşana bo vê ye ku arîkariyê bide we ji malên civakî biçin mala xwe. Bo vêya, me hevokên hêsan nivîsîne û pêvajoyên dezgehên din (Jobcenter) bi zimanekî hêsan hatine şirovekirin. Ji kerema xwe bizanin ev rênîşana tu mafê hiqûqî bo wergirtina tu arîkariyê nade we.

## *1. Beriya birina malê*

**Pêdiviyên bo birina xaniyê xwe ê taybet**

Bo ku bikarin apartimanekê kirê bikin, we divê herî kêm salek destûra mayînê wergirtibe. Tenê destûrek bes nake. Eger hûn bixwazin bi malbatî malekê kirê bikin, divê destûra mayîna hemûyan hebe. Ji kerema xwe bizanin ku di piraniya caran de hûn ê destûra mayînê wergirin (vesera destûra mayînê) ku tenê rê dide hûn apartimanekê li Dormagen`ê kirê bikin. Hûn divê mala xwe nebin bajarekî din! Eger hûn bixwazin mala xwe bibin bajarekî din, hûn divê ji daîreya koçberiyê daxwaz bikin. Bo vêya hokarên gellekî girîng hene.

**Lêgerîna bo Xanî**

Bo peydakirina xaniyekî çend rê hene:

- *Rojnameyên xwecihî*
  Rojnameyên xwecihî herdem apartimanên heyî bo kirêkirinê li bajêr û dorberê didin nasaandin. Di rekla-man de, apartiman bi kurtasî tên nasandin.
  Ev mînakek e:


**Dormagen,** Robert-Koch-Str., Apartm., 2 .OG, Kochnische, Balkon, renov. Bad, 31m² + Kellerr., 300€ KM + 100€ NK, 2 MM Kaut., ab 16.10.16,

Appartm.: Ev apartiman e
2. OG: Apartiman li qata duyem e
Kochnische: Pehtinxaneyeke piçûk heye
Balkon: Balkon heye
Renov. Bad: Serşok ji nû ve çêbûye
31m$^2$: Meziniya Xanî
300€ KM + 100 € NK: Sar (KM) û germ (NK)
2 MM deposit: Diravê bo emanet datînin (li vir: 2 kirêya digel mesrefên zêde)

- *Li Internetê lê bigerin*
  Li Internetê, hûn ê çendîn cihên lêgerîna xaniyan peyda bikin, wekî www.immoscout24.de, www.kalaydo.de, www.immonet.de. Wek mînak, eger hûn bixwazin mala xwe bibin apartimanekê li Dormagen`ê, hûn dikarin têkevin wekî bajar bikin Dormagen`ê û qadekê bo lêgerînê diyar bikin.

- *Encumenên hevkarî/çêkirinê*
  Li hin bajaran, ev encumenên hevkariyê hene. Ev encumen apartimanên erzan raber dikin. Bo kirêkirina apartimanekê ji van encumenan, hûn divê bibin endamê yek ji wan. Eger hûn bixwazin apartimanekê kirê bikin, hûn divê diravê para xwe bidin. Eger hûn apartimanê betal bikin û endambûna xwe bi dawî bînin, hûn ê diravê para xwe dîsan wergirin.

**Bihayê apartimanê**
Eger bihayê apartimanê bo rewşa we guncaw be, Jobsenter dê diravê apartimanê we bide. Bihayên guncaw li cedvela "Qasên Kirê" li vesera 6.2. hene. Li navenda kar hûn divê daxwaza malî ya apartimanê bikin. Hûn divê bixwe serdana navenda kar bikin.

Pêdivî

Bo ku bihayê xanî (KdU)  li stuyê navenda kar e, ji bilî destûra mayînê ya herî kêm 12 mehan, dayîna daxwazekê bo sûdê li gorî SGB II (Hartz IV) li navenda kar pêîwst e. Bo vê daxwazê, divê vesera „KdU“ bidin.

Diravê emanet

Eger hûn bixwazin xanî kirê bikin, hûn divê diravê emanet dayînin. Ev bo xwedanê malê ewlebûnek e û dema hûn xanî vala dikin, diravê kirdê didin û xanî rêkûpêk be, hûn ê wê wergirin. Bi asayî, du kirê wekî emanet tên dayîn. Bo xanî ku 300 € sar bihayê wê ye, dê bibe 600 €. Eger hûn nikarin vî diravî bidin, hûn divê bi Navenda Kar re pêwendiyê bigirin. Piştre, ew ê lêbinêrin ka hûn dikarin wî diravî wekî krêdî wergirin yan jî diravê garantiyê bidin. Eger hûn dirêv wekî kirêdî wergirin, hûn divê her meh hinekî bidin. Bi awayekî din, ev dirav êdî dibe yê we.

Li bara diravê kirê

Bihayê apartimanekê divê di qaseke guncaw de be. Nirxên li Vesera (Vesera 6.1) qasa herî zêde ya kirêya sar e. Ev yanê ev biha bo kirê û imkanan e. Bihayê germkirinê di qasa kirdê de tuneye.

Mînak:

Malbateke 4 kesî dikare li Dormagen`ê xanîkî kirê bike, ku herî zêde €706.80 ye (kirê û imkan). Diravê hemû apartimanên ku bihatir in Navenda Kar nade û lewre mirov nikare kirê bike.

## Cihazên bingehîn

Eger hûn ji kampa penaberîyê biçin xaniyekî taybet ji bo xwe, hûn dikarin carekê ji Navenda Kar daxwaza kelmel bikin. Ev yanê hûn yarmetiyekê bo kirrîna kelmelê apartimenê bi awayê lezgîn werdigirin. Bi vê yarmetiyê, hûn diçin firoşgeha Caritas`ê li Neuss`ê û kelmelên kevn dikirrin. Bo vê daxwazê, hûn divê bixwe serdana navenda kar bikin. Hema ku we kirêname imze kir, hûn divê vê daxwazê zûtirkê bo cihazên bingehîn bidin.
Ji kerema xwe bizanin hûn divê hemû tiştên pêwîst yeko yeko binivîsin. Nivîseke gelemperî bes nake.

Mînak:
Eger pêdiviya we bi pehtinxaneyê heye, hûn nikarin vêya binivîsin. Hûn divê zelal binivîsin çi dixwazin: 1 kabîneta dîwêr, 1 sobe, 1 kabîneta binî, ...

## Nûsazî

Eger bo cara yekem mala xwe dibin apartimanekê û pêwîst e apartiman ji nû ve saz bibe, hûn dikarin daxwaza yarmetiya nûsaziyê bikin. Ev divê zûtirkê were kirin û beriya kirrîna tiştan. Hûn dikarin daxwaza vêya bidin navenda kar a berpirs. Ji kerema xwe bizanin li vir jî lîsteya hûrgilî ya kelmel pêîwst e.

Mînak:
Eger hûn kaxiza dîwêr, çesp, reng û hwd. wekî tiştên pêwîst bixwazin bes nake. Li şûna vê, hûn divê bizelalî bibêjin çi dixwazin: 1 besteyek kaxiza dîwarî ya bingehîn, şelbikek rengê 15 lîtrî,...

**Destûra mala bi yarmetî**
Eger derhata we ya dirêv kêm be, hûn dikarin daxwaza destûra malgirtinê bikin (WBS) ku rê dide hûn mala xwe bibin apartimanekê ku sindoqên giştî arîkariya wê dikin. Hûn dikarin li odeya 1.07 li hola bajêr daxwaza WBS bikin.

**Navnivîsiya bo maleke civakî**
Eger hûn dikarin apartimanekê kirê bikin, hûn dikarin bo maleke civakî jî navnivîsiyê bikin. Ev apartiman bo kirê hinekî erzantir in. Hûn dikarin bo vêya li odeya 1.07 li hola bajêr navnivîsî bikin.

## *2. Piştî birina malê*

**Paqijkirina korîdorê**
Gellek apartiman, digel kirênişînên din, ji we dixwazin rêya holê paqij bikin. Piranî, rêzikek heye, ji ber ku ev navbera kirênîşnan de dabeş dibe. Ev yek bo xizmetên zivistanê jî dibe ku divê li zivistanê piştrast bike berf ser rê nemaye. Bo hemû hûrgiliyan bi xwedanê malê re pêwendiyê çêbikin.

**Rêzikên xênî**
Li her kirêkirinê de, rêzikên xaniyan hene, ku bo hemû aliyan xwedan itibar in û bi hev re jiyana nava malan diyar dikin. Raçavkirina rêzikên xaniyan pirr girîng e ji ber ku hûn bi kesên din re li xaniyekî dijîn û her kesî tenê apartimanê xwe kirê kiriye. Eger hûn rêzikên xaniyan binpê bikin, xwedanê xênî dikare kirênameya we betal bike. Ev hetanî wê demê rast e ku cîranên we gazindeyan dikin ku hûn pirr deng dikin. Rêzikên girîng ên xaniyan ev in:

- *Dema bêhhnvedanê*
  Her kirêkêş berpirs e ku nehêle deng li apartiman, xanî, hewş û milkê derkeve. Divê dema 13 heya 15 herwiha 22 heya 6 sibê taybet were raçavkirin. Radyo, televîzyon, dezgeha CD û h wd.

Divê dengê wan li odeyan maqûl be. Dayîkbav berpirs in ku van saetan de zarokan bêdeng bikin. Eger merasim hebe, divê di demeke baş de hem kirênişîn agahdar bin.

- *Şûştina cilan*
  Şûştina cilan (û ferşan) tenê divê li cihên diyarbûyî be. Eger hûn cilên xwe li balkonê ziwa bikin, ev divê wisan be ku bo kirênişînên din neyê dîtin.

**Germkirin û balêdan**
Di vê beşê de, em ê bibêjin çawan mala xwe baş germ bikin û bayê wê biguherin ku mesrefa we zêde nebe û li fatûreyê diravê zêde nedin.

- *Germaya durist a odeyê*
  Zêdekirina her dereceya germaya odeyê diravê fatûreyê zêde dike. Germaya odeyê li cihê divê ji 20 ° C zêdetir nebe, eger ev germahiya rihet be. Her dereceyeke kêm, enerjiya germayê xwedî dike. Tewsiyeya me bo odeyan: li pehtinxaneyê 18 ° C, li odeya razanê 17 ° C. Tişta dawîn germahiya rihetbûna ferdî ye. Ew girêdayî germaya dîwar û pencereyan e. Li şev yan dema rojê ku hûn bi qasî çend saetan li malê nînin, germaya odeyê çend dereceyan li 18 ° C  kêm bikin. Eger çend rojan li malê nînin, divê germahî ser 15 ° C, eger demeke dirêj bimînin, hinekî kêmtir bikin. Li şev, germaya odeyê li cihên rûniştinê û karkirinê dikarin 5 ° C kêmtir bin. Pergalên nûjen ên germahiyê bi awayê navendî rê didin ku germaya odeyê kêm bikin.

- *Kontrola germaya baş*
  Valvên têrmostatîk du beş in: Li serê têrmostatîkê, hûn dikarin germaya odeyê diyar bikin. Ew germaya odeyê nas dike û ji valvê (yekê) re dibêje divê çiqas av biçe nava radyatorê ku bigihîje germaya odeyê ya bi dilê we. Her çiqasî valv bikare germaya odeyê rasttir xwedî bike, ewqasî enerjî kêmtir bi kar tê. Her çiqasî malek kêmtir dapoşî be, rêy herî baş ew e dema cihek bi kar nayê, germaya wir kêm bikin. Ji bilî serên klasîk ên têrmostatan, hin têrmostat bi bername ne, ku tenê demên diyar dibin germaya bi dilê mirov çêdikin. Mirov dikare wan diyar bike ku germaya odeyê hin demên rojl kêm an zêde bikin. Eger hûn wek mînak sibehê derkevin derve, têrmostat dê germayê kêm bike. Dema êvarê tên malê, kontrol dê germaya baş di demê de amade bike. Bikaranîna têrmostatan heya 10% enerjiyê kêm dike.

- *Hewakêşiya baş*
  Hetanî di odeyên ku baş germ bûne de, nem hêdî hêdî berhev dibe. Di maleke çar kesî de, diwanzdeh lîtr avek bi nefes, serşok, pehtin û şûştinê her roj dikeve hewayê. Lewre, hewakêşiya rêkûpêk li demsala germkirinê bo kêmkirina nema li cihên jiyanê pêwîst e ku hewayeke baş amade bibe. Ya baş ew e çend caran li rojê pencereyan vekin û hewayê zû biguherin û hin caran heya pênc deqeyan („hewayê bi awayê gurr biguherin“) ku nem bi giştî derkeve. Her çiqasî hewaya odeyê hêniktir be, zêdetir divê hewaya odeyê biguhere ku pêşiya jengara ji ber nemê were girtin.

**Hîştina zibilan be rêkan boriyên avkêşê û tiwalêtê**
Ji kerema xwe bizanin hîştina zibil û bermayan li avkêşê yan tiwalêtê qedexe ye ji ber ew bo vî karî nînin. Eger avkêş were girtin, renge xwedanê xênî we neçar bike wê paqij bikin.

**Cudakirina zibilan**
Li Almanyayê, zibil cuda dibin, bo ku beşên cuda bikarin werin nûvekirn. Bi giştî ev cûre zibil hene:

Kaxizên kevn (zibildanka kesk/hêşîn)
Van dixin zibildanka kesk a veçêkirinê: besteyên ji kaxizan çêbûne, Karton û krêyon, rojname/kovar, pirtûk û kaxizên zêde. Van nekin nava vê zibildankê: Cilên rûnkî, kaxizên paqijiyê (wekî dezmalên destan, pîneyên jinan, dezmalên sifreyê), paketên şîr û avamêweyan, kaxizên dapoşî, kaxizên dirryayî yên dîwêr, paketên pîtzayê, kaxizên karbonê, foyl, kompozît û hwd. Kardbord û kartonên ku li kêleka zibildanka kesk bin dê neyên avêtin.

Zibildanka Bio (zibildanka qemer)
Cihê zibilan a bermaya her kesî li her hefteyê bi jevcudakirina bixwe dikare dakeve 20l, bi bikaranîna zibildanka bio ev bo her kesî li hefteyê dibe 15l. Bo jevcudakirina ser milkê, li gorî daxwza nivîskî mesrefeye cuda heye. Dema zibildanka bio bi kar tê, ev dirav nayê wergirtin.
*Li zibildanka qemer ev hene:*
Bermaya pehtinxaneyê: Qalikên hêkan, binê qahweyê, parzûnê qahweyê, pirtikê çayê, parzûnê çay û hwd. Zibila mêwe û sebze: pirtikên mêweyan. mêweyên ketî, dendikên mêweyan, sêv, gêlyaz, kelem, kahû, qalikê pîvazan, Bermaya baxçeyê: qirşik, gulên hişkbûyî, pirtikê kûzikan (kêm bin), şaxên daran, pîne û potik, gihayên çinî, pirtikên şivikan, qalikên keleman, kolên gihayan, kolên pejalpejalî, gihayên guldankan. Tenê tiştên li nava zibildankê tên birin. Ji kerema xwe zibilên bio nava kîsikan de nekin zibildankê

## Bermaya pirtikan (zibildanka boz)

Hetanî eger we hemû beşên dikarin werin veşêkirin bixin nava amanên têkildar ên berhevkirinê, lê mixabin yên ku nayên veşêkirin dimînin. Ew bo zibildanka boz in. Li gorî rêzika zibilan a Bjarê Dormagen`ê, kesê neçar divê bo her kesê tomarbûyî herî kêm amana 24 lîtrî ya zibildankê amde bike. Li gorî daxwzaê, çend kesên lêspartî (wek mînak cîran) dikarin komekê bo hevbeşkirina amanên zibilan çêbikin, ku dikare mesrefa wan kêm bike. Zibildanka boz bi derpoşa sût di dema 14 rojan a berhevkirina zibilan tê birin.

*Zibildanka bermaya pirtikan ev in:*

Guldank, rûnê kebabkirin û pehtinê, tiraş, belgî, şûşeyên pencereyan, çira, fîlm, pênivîsên sertûj, pênivîsên ser gulover, kartrîca pênivîsan, texteyê maseyan, pirtikên lampan, gêzik, zibila pisîkan, seramîk, mûm, kaxiza karbonê, tiyûbên plastîkî, bizmar, darikên guhan, dezmala destî, pêlîstokên plastîkî, kelmelên plastîkî yên malê, çînî, kaset, pîç, bermaya xwarina (pehtî), kîsikê simikê, cihazên erdê, simika xiyavanê, kêş, lûleya kaxiza dîwarî, pîneyê jinan, bandaj, tampon, vîdyo kasêt, qûma hûr, xuliya cixareyan. Hûrikê dîwaran, kevir û xuliya kolyayî bo zibildanka boz in:

## Zibila metirsîdar

Tiştên gemarê çêdikin (zibila metirsîdar) yên ji malên taybet dikarin bê dirav amade bibin (rûnê bikarhatî herî zêde 5 L, madeyên zibila taybet heya 20 kg).

## Zibila elektronîk

Amûrên piçûk ln elektrîk ku ji 20cm mezintir nînin, dikarin ji qasên kelmelên asayî yên bê dirav li mobayla gemarkar bêpar bin. Amûrên mezintir ên elektrîk ku ji 20cm mezintir in dikarin bê diravê têkbirinê bi qasa kelmelên malê werin dayîn. Herwiha, ev amêr bo berhevkirinê dikarin bi awayê cuda werin tomarkirin.

### Zibilên gir

Zibila gir ew zibila malê ye ku, ji ber endazeya xwe ya gir, li zibildankê de nabe. Şîrketa berhevkirina zibilan dikare zibila gir ragihîne yan li kendalekî were çalkirin. Eger hûn dixwazin zibila we were berhevkirin (raketok, ref, mase, ...), hûn divê bo vê ya hevahengiyê bikin û şev bi awayekî durist zibilê li kêleka rê dayînin.

Hevdîtin dikarin li vir diyar bibin:
https://www.entsorgung-niederrhein.de/

## *3. Mesrefa xaniyan*

**Elektrîk**

Dema hûn mala xwe dibin apartimanekê, hûn ê xwebixwe bi berpirsê ceryana bajarê lê ne re bikevin têkiliyê. Bo vêya, pêîwst e hejmara endazeya ceryanê bizanin ku xwedanê xênî dikare bide we. Dema navnivîsiyê dikin, hûn divê rewşa heyî ji şîrketê re bibêjin (hejmara ser jimarkerê beriya bêhnokê). Eger hûn bixwazin, hûn dikarin pêkhînerê ceryanê jî biguherin, hûn dikarin bixwe li Internetê agahdar bikin.

**Telefon / Internet**

Eger hûn bixwazin li apartimana xwe têkiliya Internet û/yan telefonê hebe, hûn dikarin bo vêya pêkhînerekî diyar bikin. Ew pêkhîner dê ID`ya têkiliyê ji we re bibêje ku dikare bo we amade bibe. Dema hûn girêbestê imze dikin, bizanin ka kîjan mesref mehane ne, eger pêwîst be, bo pêvekirinê jî. Girêbestên pêkhîneran li vir pirr cuda ne û dikarin demên mehekê heya çend salan bin. Li vê demê de, hûn divê teqez diravê têkiliyê bidin.

**TV**

Bi asayî, apartimanê we pêveka wê ya TV`yê heye. Eger ev kabla pêvekê be, hûn bi asayî bi rêya ziyanên piçûk diravê wê didin. Li gorî pêkhînerê ku hûn hildibijêrin, bo wergirtina kanalên biyanî hûn dikarin besteyên cûrbecûr rezerv bikin.

Danîna sêlên satelîtan li gellek malan qedexe ye. Ji kerema xwe beriya danînê, digel xwedanê malê hevaheng bikin ka dibe yan na.

### Sîgorte
Sîgorte bo parastinê bi kar tê. Em pêşniyar dikin sîgorteya berpirsyariyê (malbatê) û kelmelên malê bikirrin. Sîgorteya kelmelan ku pêdiviya we pê heye ew e ku li apartimanê pêwîstiya we pê heye. Sîgorteya berpirsyariyê dema ku ziyan li we û kesên din bikeve we ewle dike.

### Kirrînên nû
Qasa diravê ku hûn her meh ji Job Center (Navenda Kar) werdigirin, tê de qaseke piçûk heye ku bo kirrîna cihaz an kelmelan e. Wek mînak, eger cilşoya we xera bibe, hûn ê diravê yeke nû wernegirin, lê hûn divê ji van diravê rezervê bidin.

### Mesrefên zêde
Ji bilî kirêya we, hûn her meh diraveke zêde jî didin xwedanê xênî. Salê carekê hûn ê encama wê wergirin. Piştre, renge hûn hin dirav jî dîsan bidin. Hevdem, dibe ku hûn neçar bin diravê zêdetir bidin.

## 4. Têbînî

# 5. Pêvek

## 1.1 Mietobergrenzen (Stand: 01.02.2019)

**Bruttokaltmietobergrenzen**

| | **Vergleichsraum** | 1 Person 50 m² | 2 Personen 65 m² | 3 Personen 80 m² | 4 Personen 95 m² | 5 Personen 110 m² | je weitere Person + 15 m² |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Jüchen, Grevenbroich Rommerskirchen | 410,00 € | 488,15 € | 576,80 € | 718,20 € | 809,60 € | 110,40 € |
| 2 | Dormagen | 424,50 € | 521,30 € | 635,20 € | 745,75 € | 921,80 € | 125,70 € |
| 3 | Neuss | 418,00 € | 517,40 € | 624,00 € | 739,10 € | 862,40 € | 117,60 € |
| 4 | Kaarst | 475,50 € | 573,30 € | 695,20 € | 818,90 € | 953,70 € | 130,05 € |
| 5 | Meerbusch | 417,50 € | 557,70 € | 660,00 € | 851,20 € | 1016,40 € | 138,60 € |
| 6 | Korschenbroich | 412,00 € | 501,15 € | 636,80 € | 759,05 € | 839,30 € | 114,45 € |

**Bei Neuanmietungen einzuhaltende Betriebskostenmindestgrenzen**

| | **Vergleichsraum** | 1 Person 50 m² | 2 Personen 65 m² | 3 Personen 80 m² | 4 Personen 95 m² | 5 Personen 110 m² | je weitere Person + 15 m² |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Jüchen, Grevenbroich Rommerskirchen | 69,30 € | 75,53 € | 94,08 € | 116,38 € | 119,35 € | 16,28 € |
| 2 | Dormagen | 65,80 € | 78,72 € | 94,64 € | 115,71 € | 129,36 € | 17,64 € |
| 3 | Neuss | 82,95 € | 99,19 € | 126,00 € | 152,29 € | 171,71 € | 23,42 € |
| 4 | Kaarst | 62,30 € | 86,45 € | 105,28 € | 117,71 € | 120,89 € | 16,49 € |
| 5 | Meerbusch | 64,40 € | 84,18 € | 100,80 € | 123,03 € | 125,51 € | 17,12 € |
| 6 | Korschenbroich | 49,00 € | 70,07 € | 105,28 € | 111,06 € | 120,89 € | 16,49 € |

## *Çêklîsta kirêkirina apartimanekê*

- ☐ Gelo destûra we ya mayînê bo herî kêm 12 mehan heye
- ☐ We bo malên civakî navnivîsî kiriye?
- ☐ We bo sûdên SGB II li navenda kar daxwaz kiriye?
- ☐ Gelo xwedanê malê forma „Danasîna kirê“ tijî kiriye? (Li Jobcenter heye)
- ☐ Gelo we forma „Danasîna kirê“ daye Jobcenter`ê?
- ☐ Gelo we kirêname ji Jobcenter`ê wergirtiye?
- ☐ Gelo we kirênameyek imze kirye?
- ☐ Gelo we bo cihazên bingehîn daxwaz kiriye?
- ☐ Gelo we daxwaza mesrefa nûsaziyê kriye?
- ☐ Gelo we li firoşgeha CARITAS`ê kelmel hilbijartiye?

## *Çêklîsta bo valakirina apartimanê*

- ☐ Hemû apartimanê paqij bikin
- ☐ Pehtinxaneyê pqaij bikin
(Sobe, firin, kabînêt & sardank)
- ☐ Hemû xwarinê rakin
- ☐ Zibilan bavêjin
- ☐ Hemû kabînêt û refan baş paqij bikin
- ☐ Serşokê paqij bikin
(Tiwalêt, avrêj, golehesin & erd)

Erdê apartimanê pak bikin

- ☐ Pencereyên apartimanê paqij bikin
- ☐ Kelmel û qoltixan rêkpêk bikin
- ☐ Hemû tiştên şexsî hildin yan rakin
- ☐ Her kêmasiya apartimanê rapor bikin
(mînak, tiwalêta şikestî, sobe û hwd.)
- ☐ Kilîtên hemû kabînêtan dayîn ser
- ☐ Digel muqatekar hevdîtinê bikin

Gefördert durch:

KOMM-AN NRW

**Weşanger:**
Stadt Dormagen
Fachbereich Integration
Paul-Wierich-Platz 2
41539 Dormagen

Ji: 06/2018

DORMAGEN
Natürlich! Am Rhein.